Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1271 7-Gulan-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Hunera ji bermahiyan





**Fatîma El-Mutavîrî ya ji benderek li Basrayê ye, kartonên zexm ên hatine avêtin kom dike, li ser wan bi rêya firçe û rengên xwe, hunerek ava dike û bi vî awayî bermahiyan vediguherîne tabloyên hunerî ku di hemûyan de serpêhatiyek heye.**

Fatîma El-Mutavîrî tîne ziman ku bi bikaranîna nasnameya xwe, hewl dide materyalên bermayî veguherîne berhemên hunerî. Bi vê rêbazê hem ewê ji qirêjiya jîngehê xilas be hem jî dê modelên hunerê biafirînin. Di demekê de ku qûtiyên karton ên êdî bikêr nayên li quncikên bajarên qerebalix kom dibin de, wênesaz Fatîma El-Mutawîrî wan perçeyên terikandî berhev dike û giyanek nû dide wan. Bi firçe û rengên xwe, tenê li ser karton wêne çênake, di heman demê de bîranînan ji nû ve dinivîse û şopên bajarê xwe yê ku hîn jî di hundirê xwe de lê dide tamîr dike. Di navbera xêz û siyan de, raman bi materyalê re dibe yek û huner çêdibe, ku di nav tebeqeyên xwe de çîroka welatekî û qêrîneke bedewiyê ku ji kêlekê tê, hildigire.

**‘Hezkirina hunerê zû de di dilê min de hebû’**

Fatîma El-Mutavîrî ya 37 salî, ji navçeya Fao ya parêzgeha Basraya li başûrê Iraqê, li ser destpêka rêwîtiya xwe ya hunerî got: “Rêwîtiya min a bi wênesaziyê re, di rabirdûyek ne ewqas dûr de destpê kir. Lê hezkirina ji hunerê, ev demeke dirêj bû di dilê min de hebû. Destpêkê min girîngiya ku heq dikir, nedida vê jêhatiya xwe. Piştre min di hundirê xwe de enerjiyeke kûr û behreyek rastîn keşf kir ku her roj mezin dibû. Ez bi taybetî bi cîhana kartonê re eleqedar bûm. Min li wir azadiya îfadeyê û şadiya avakariyê dît. Min fêm kir ku pêwîst e ez vê jêhatîbûna xwe hembêz bikim, bipêş bixim û pê re pêşve biçim.”

**‘Materyalek jirêzê ye lê gelek çîrokan dihewîne’**

Fatîma diyar kir ku di mala xwe de quncikek taybet çêkiriye ku tê de berhemên xwe yên hunerî diafirîne û wiha got: “Her hunermendek hewceyê cihekî ye ku tê de xwe bi ewle û aydê xwe hîs bike. Min ew cîh di nav reng û materyalên xwe de dît. Karton çavkaniya min a yekem a îlhamê bû. Ew materyalek hêsan e lê gelek çîrokan dihewîne. Ji rojên dibistanê ve jê hezdikim; ji nû ve şekil dike, ji peyker û hêza xwe ya xeyalê ku derdikeve, dikarim fikrên susret derxim. Dema ku çavê min bi perçeyek qartonê dikeve, di wê demê de fikrek ava dibe û destê min teşe dide wê.”

**‘Dikarim fikrên xwe azad xêz bikim’**

Fatîma got ku yek ji mezintirîn zehmetiyên pê re rû bi rû mane, xebata bi kartonê ye û sedemên wê wiha vegot: “Karton ne tenê ruyeke ku li ser xet birêsî; avahiyek bi pêdiviyên taybetî. Pêwîst e ku cureyek kartonê were bijartin ku zexm, domdar û li hember tevger û xêzkirinê berxwedêr be. Bi taybetî dema ku berhemên xwe hildigrim, li kartonên hem xurt hem jî domdar digerim. Bi vê re bêyî ku tirsa hurguliyan bijîm, dikarim fikrên xwe azad xêz bikim.”

**Di karê peykersazî û kolandinê de kêr bikar tîne**

Fatîma destnîşan kir ku karton ji ber ku ew materyalek ji kaxezê ye, li hember şilbûn û boyaxên bi rûn berxwedêr nîne û wiha pê de çû: “Ji ber vê yekê ez boyaxa akrîlîk wek bingeh bikar tînim. Akrîlîk hem domdarî û hem jî nermbûnê peyda dike. Ez bi sepandina tebeqeyan dighîjim rengê ku ez dixwazim.” Fatîma diyar kir ku ew di karên xwe yên peykersaziyê û kolandinê de kêrên bi şekil û mezinahîyên cûrbecûr bikar tîne û got ku her kêr xwedî fonksiyoneke xwe ya taybet e. Fatîma wiha got: “Her amûra birînê ji bo goşeyek, rûyek an kûrahiyek bi taybetî tê bikaranîn. Ji ber ku xebata li ser kartonê ji bo afirandina hevsengiyek di navbera siya û mezinahîyê de rastbûn û baldariyê hewce dike.”

**Serpêhatiya bajarê Fao**

Fatîma derheqê berhemên hunerî de wiha got: “Her berhema ku ez çêdikim, ji bo min cihekî wê yê girîng heye.  Lê ya ku nêzî rihê min e, tabloya ku min navçeya Fao vegotî ye. Di vê xebatê de min nexşeya Basra mîna çarçoveyek nasnameyê bikar aniye, piştî wê min deriyê dîrokî yê Fao jî li ser xêza xwe zêde kir. Ji ber ku Fao cihekî ye ku bi deryayê tê naskirin, min kelekên navdar ên bi navê ‘Lenje’ jî lê zêde kirin. Ev deryavanî, jiyana me ya benderê û çanda masîgiriyê nîşan dide.  Ev tablo ne tenê wêneyek e, çîroka bajarekî ku tije hesret û hunerê ye jî.”

**‘Dixwazim herêma xwe nîşan bidim’**

Fatîma El-Mutevîrî di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku xwe tenê di fikrek de dîl nekiriye, guhertin û veguhertin sirra afrîneriya daîmî ye. Fatîma wiha got: “Dubarekirina heman fikrî, dê nebaş be. Ez her tim li tiştên ku pir balê bikişînin digerim. Armanca min ew e ku bi hunera xwe ji herêma xwe derkevim û bi beşdarbûna di pêşangehên derveyî de navçeya Fao û Basrayê temsîl bikim. Ji ber ku Fao tijî mirovên jêhatî ye ku piştgiriya ku heq dikin nagirin.

**NÛ JINHA**

## Bi kamîreya Hemze Sêvo



## FERHENGA BIWÊJAN

**Bidestûlep e:**
- Jêhatî ye; bikêr e; jîr e; kar ji destê wî tên.

**Çarçav e:**
- Zana ye; tiştan zû hest dike; biaqil e.

**Çar çavên wî hene:**
- Bi heman wateyê.

**Çavbel e:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên wî direqisin:**
- Pir jîr e; jêhatî ye; pêbî ye; kêrhatî ye.

**Çavên wî dilîzin/dileyzin:**
- Pir jîr e.

**Çavê xwe vekir:**
- Şiyar bû; haya wî ji derdorên wî çêbû; bi zanebûn liviya.
Çawa min got nikulê wî sor e, di cih de got kew e.
- Pir jîr e; zû tiştan fêm dike.

**Çeknas e:**
- Kesê mirovan zû nas dike, yan ji dirofên wan, wan nas dike ji bo wan tê gotin.

**Çeqûber e:**
- Destên wî pir sivirk in; di karê xwe de pir jîr e.

**Çil rûvî di serê wî de digerin dûvê yekî li dûvê yê din nakeve:**
- Pir jîr e; jêhatî ye; nehs e; fenek e.

**Çiqas tu hilavêjî wê li ser lingên xwe bisekine:**
- Jêhatî ye; jîr e; nayê xapandin; ti kes pê nikare.

**Dema derketî bi şûn xwe ve çengek xwê avêtiye cihê jê hatî:**
- Pir jîr e; bîjî ye; weke şeytên e; guhên wî dilepitin.

**Destê wî zêr dibirre:**
- Jêhatî ye; her kar ji destê wî tê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Pêwîst bû li ser rola jin zêdetir bal bihata kişandin’



Endama Koordînasyona Kongra Star Şîraz Hemo diyar kir ku di Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî  li Rojava de rola jin sereke bû û wiha got: “Jin bi hazirtiya konferansê rabû û rola wê tê de sereke bû, lê pêwîst bû di konferansê de zêdetir bal hatiba kişand li ser rewş û rola jin.”**R-2**

## 6’ê Gulanê; Ne hewla yekem a armanckirina Rêbertî bû



Hewildanên dijmin ji bo hedefgirtina Rêber Apo ji destpêka Tevgera Azdiyê ve didomin. Di 6’ê Gulana 1996’an de bi destê gladiyoya NATO’yê ku DYA serkêşiya wê dikir li Şamê li dijî Rêber Apo armanckirina bombeyî pêk hat.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1271 7-Gulan-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S


## Konferansa yekîtiyê ji hunermendan re bû cihê hêviyê




Her çiqasî dereng jî ket, lê banga hunermendan a bi civakê re ya ji bo yekîtiya gelê Kurd bi cih hat. Hunermend Roj Elî diyar kir ku dijminê gelê Kurd ji bo li cîhanê Kurdan tune bikin, di Rohjilata Navîn de gelek planên qirêj pêk anîn, yek jê avakirina DAIŞ`ê bû.**R-7**

# RÊBER APO: PARÊZNAMEYÊN MIN LI KU BIN EZ LI WIR IM

Fikir û paradîgmaya Rêber Apo êdî di asta navneteweyî de tê qebûlkirin. Li çar aliyên cîhanê parêzname û pirtûkên wî tên xwendin û bandoreke mezin dide avakirin. Ji gelek derdoran mirov tevlî xwendinê dibin, ev yek jî nîşan dide ku fikrê Rêber Apo asoyekî nû dide tevgerên azadiyê û jinê yên ku li dijî sîstema hegemonîk di nava lêgerînên alternatîf de ne û êdî Rêber Apo di asta gerdûnî de weke rêberekî tê dîtin.**R-5**









## Bere Beyt; Yek ji kevintirîn gundên Xiristyanan li Rojavayê Kurdistanê



Gundê Bere Beytê yê girêdayî bajarê Dêrikê, yek ji kevintirîn gundên xiristyanan yên li Rojavayê Kurdistanê ye, dîroka avabûna gund jî vedgere beriya hezar û 500 salî û dêreke kevnar tê de heye.**R-6**

## ‘Bi saya Rêveberiya Xweser Civaka Êzidî ji komkujiyan rizgar bû’



Rêvebera Ofîsa Civaka Êzidî ya Sûriyê Sûad Hiso diyar kir ku hejimara Êzidiyên di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de berî şoreşê bi hezara bûn, lê ji ber rewşa şer gelek Êzidî koçberî derveyî herêmê bûn û îro bi saya Rêveberiya Xweser civaka Êzidî ji komkujiyan rizgar bû.**R-6**

Ez jin im — Nehîr pale R-2

Bendava Şehîdan: Têkçûna pergala osmaniyên serdemê — Dilyar Cizîrî R-4

“Qanûna Tuncelî” — Farûk Sakik R-5
HTŞ’ê Sûriyê ber bi nezelaliyê ve dibe — Zekî Bedran R-5

Wêjevan hîna li benda desthilatê ne ku rol û berpirsyariya wan diyar bike — Kemal Necim R-7

# ‘Pêwîst bû li ser rola jin zêdetir bal bihata kişandin’

Endama Koordînasyona Kongra Star Şîraz Hemo diyar kir ku di Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojava de rola jin sereke bû û wiha got: “Jin bi hazirtiya konferansê rabû û rola wê tê de sereke bû, lê pêwîst bû di konferansê de zêdetir bal hatiba kişand li ser rewş û rola jin.”

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

Derbarê rola jin di lidarxistina Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojava de Endama Koordînasyona Kongra Star Şêraz Hemo bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**-Beriya Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî bê lidarxistin 3`ê konferansên netewî yên jin hatin lidarxistin, bwan konferansan çi qas bandor li ser konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî kir?**

Weke tê zanîn 26`ê Nîsanê konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê hate lidarxistin. Ev konferans bi salan bû ku nîqaşên wê dihatin kirin, herwiha ji bo tevahiya gelê kurd weke xwnekê bû. Konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî xwedî pêvejoyeke dîrokî bû. Ji bo dîroka kurd û kurdistanê, di heman demê de ji bo tevhiya gelê kurd 26`ê Nîsanê rojeke dîrokî ye. Ev konferansê Yekrêzî û Yekhelwesa Kurdî bû bersivek ji bo pêşketinên ku li herêmê tên kirin û li ser vî bingehî hate lidarxistin. Ev konferans bû bersivek ji bo rewşa kurdan ji ber ku em dizanin ku îro gelê Kurd di Rojhilata Navîn de roleke serek dilîzin. Edî Pirsgirêka gelê Kurd ji pirsgirêka Kurdî dema niha bûye dozekeke Kurdî, herwiha pirgirêka gelê Kurd êdî bû ye pirsgirêke cîhanî. Lewma jî pir girîng e ku îro rola gelê Kurd di çareseriya Sûriyê ya siyasî de hebe û gelê Kurd di Sûriyê de roleke sereke bilîze. Ji ber vê yekê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî ku hate çêkirin bû hêzek ji bo tevahiya Sûriyê ku karibe li ser piyan raweste û hêza xwe bigire, herwiha êdî roj hatlye ku yekîtiya Sûriyê ji hemû pêkhateyan were çêkirin. Di hundirê konferansê yekrêzî û yekhelwesta kurdî weke jin hêza xwe ji konferansê jin yê ku beriya wê hatiya lidarxistin girtbû. Hem konferansê jin yê ku li ser asta Kurdistanê hatbû lidarxistin û hem jî beriya wê konferansa Jin ya Kurdî ku li ser asta Rojavayê Kurdistanê hatbû lidarxistin hêz girtbû. Ev yek jî bandoreke erênî li konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî kir, di konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî de gelek nêrîn û pêşnayar hatin kirin lê ne li gorî asta îfadekirina têkoşîn û keda ku jin li herêman Bakur û Rojhilatê Sûriyê daya meşandin.

**-Rola jin di Konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî de hate çi astê hebû, herwiha xalên ku ji bo jinê hatibûn diyarkirin çibûn û hûn çawa dinrxînin?**

Di konfernasê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî de jin bi hazirtiya wê rabû û roleke serek di konferansê de lîst. Herwiha di konfernasê Kurdî de ji bo jin gelek nêrînên cuda derketin, lê pêwîstbû zêdetir bal li ser rewş û rola jin di konferansê de bihatiba kişandin û tekezkirin. Pêwîstbû ku di hundirê konferansê de tekez li ser rol û rewşa jin bi hate kirin, hem jî xalên ku di hundirê konferansê kurdî de ji bo jin hatin nîqaşkirin têrênekirin.Li gorî şoreşa jin li Rojavayê Kurdistanê, herwiha keda ku jin li Rojavayê Kurdistanê daye meşandin, pêwîstbû ku zêdetir û bi berferhî bal li ser rol û rewşa jinê bihatiba kişandin. Lihevkirinên ku bi hêzên Navdewletî re di derbarê jin de hatbûn çêkirin pêwîstbû ku ew jî ji bo mafê jin di konferansê Yekrêzî û Yekhelewsta Kurdî de li ser hatbe tekezkirin. Li hemberî wê jî nêrîn û nirxandinên jin di konferansê Kurdî de gelekî balkêşbûn, herwiha tekezkirina li ser rola jin di hebû beşan û astan de hebû lê ne zêde, ji aliyê siyasî, civakî, aborî, leşkerî, çandî û hew.. di hemû aliyên jiyanê de çawa jinê roleke mezin lîst û çawa muhra xwe li dîroka jin da û li ser destkeftiyên bi destxistine. Ev bi giştî di hundirê konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî de anî ziman û li ser hate tekezkirin.

**-Konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî di pêvejoyekî ku Rêber Apo banga Aştî û Civaka Dîmokratîk kir de hate lidarxistin, bangê çiqas bandor li ser konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî kir?**

Şert û mercên ku heyî ku konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî were lidarxistin biriya banga dîrokî ya Rêber Apo bi navê Aşîtî û civaka Dîmokratîk bû, herwiha banga Rêber Apo hêzeke hêzeke da Konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî ku were lidarxistin.Di heman demê de banga Rêber Apo gelekî girîngbû û li ser vê bingehê konferansê Kurdî hate lidarxistin, ji ber ku herêm û bi taybet Rojhilata Navîn hewcedarî aştî û dîmokratiyê ye. Rojhilata Navîn bi zengînbûna xwe, çand û şarstaniya xwe ya dewlmed hewcedarî civakeke dîmokratîke, ji ber vê yekê pêwîst e Rojhilata Navîn bi aşîtî jiyan bike û bi taybet di kurdistanê de ji ber ku ew bixe dilê Rojhilata Navîn e. Ev pêşketinên siyasî yên ku çêbûn bi saya banga dîrokî a Rêber Apo ji bo çareseriya herêmê di van şert û bercan de sûdekî mezin hate girtin. Li gorî tiştên ku tên pêşkêşkirin û gavên li ser asta Kurdî hatin avêtin bi temamî cihê girtiye, em werin hevrûkirinê di navbera herêmên din yên Sûriyê de çêkin ku çawa di nava aloziyekê de jiyandikin. Ji ber vê yekê Sûriyê bi reng bûna xwe nikare bibe Sûriyeke nû li gorî hêviyên gelê Sûriyê û bi taybet jinên Sûriyê.

Banga min ji her jinekê re heye ku weke jinên Kurd pêşengtiyê bikin, herwiha pêwîst e ku em vê xetê berdewam bikin. Divê her jinek xwedî li mafê xwe derkeve û pêşengtiyê ji bo civaka xwe bike. Di konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî de erke û perpirsyarî girt li ser milê me bi tevhiya ye. Em jî weke jin erk û berpirsyariyê digirin li ser milê xwe ku em ê xalên ku di konferansê Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî hatine pêşkirin serkêşiyê bikin.

# Piştî Şoreşa Rojava nerîna civakê ya li dijî jinê hat guhertin

**Nalîn Ehmed/Qamişlo**

**Şoreşa Rojava ked û hêza jinan ya bi salan ku hatibû veşartin, derxist holê û pêşxist. Jinên Bakur û Rohilatê Sûriyê zihniyeta baviksalarî têk bir. Niha jin pêdiviyên jiyanê bi keda destê xwe peyda dike. Berfîn Mihemed û Berîya Hesen diyar kirin ku ji ber jin xwedî hêz û îradeye, zihniyata baviksalarî derfeta pêşxistinê li pêşiya jinê asteng dike.**

Di serdema civaka xwezayî de ku wekhevî, azadî û hezkirinê dihat naskirin, bi taybetî ku bi pêşengiya jinan dihat birêvebirin. Bi derketina baviksalarî re, derbeyeke mezin li jinan ket, rêvebirina civakê ji destê wê hat birin û keda wê jî ya bi salan hat veşartin. Heta berî çend salan jî bi destê desthilatdaran ev ked dihat veşartin. Lê bi lidarxistina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re êdî jin bi tîkoşîn, keda xwe derxist holê û ji hemû cîhanê re hêza xwe nîşan didin. Şoreşê gelek derfetên zêrîn li ber jinan vekirin. Bê goman jin di gelek zehmetiyan re derbas bûn lê tevlî vê yekê jî dev ji pêşxistina xwe bernedan. Jinên Rojava bi hemû pêkhatiyên xwe, di her qadê de cihê xwe girtin û ji civakê re dan nîşandan ku ew xwedî hêz û dîrokek dewlemendin. Li ser mijarê jinên ciwan yên bi navên Berfîn Mihemed û Berîya Hesen ku di bazara mezin ya cilan ya bajarê Qamişlo de kar dikin, ji rojnameya me re axivî û diyar kirin ku her jin dikare kar bike û pêdiviyên jiyana xwe û ya malbata xwe jî, bi keda destê xwe bidest bixe. Tevlî ku fonê wan pir kême ew di hefteyê de tenê 200 hezarî digirin dest.

**`Karê jinê ne tenê karê malê ye`**

Berfîn Mihamed ya ku ji bajarê Efrîna dagîrkirî ye wiha di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Dema ku jin kar dike nayê wê wateya ku tenê ji bo qezenkirina fona ye, tersî vê yekê her mirovek xwdî jêhatiyeke taybet e. Bê goman her jinek jî xwedî jêhatiyeke taybet e, lê ji ber zihniyeta civakê ya ku jin tenê bi karê malê ve girê dide, bi saya felsefeya Şoreşa Rojava jina ev zihniyet têk bir. Guhertina mezin ku di nava bajar de ya beriya şoreşê û pitşî şoreşê diyar e. Berî mirov kêm didît ku jin di dukanên cilan de yan di bazaran de kar dike, lê niha jin di her deverê de cihê xwe digire û xwe ji civakê re dide qebûlkirin.”

Berfîn diyar kir ku ew li Efrîn xwedî salona bedewiyê ya jinan bû, lê piştê derketina wan ji bajêr, derfeta vekirina heman karî li Qamişlo nîn bû ku berdewam bike. Lewra wê dest bi karê firotina cilan nava bazarê de kir.

Berfîn Mihemed wiha axaftina xwe bidawî kir: “Divê jin û keçên ciwan bi gotinên xelkê bandor nebin, çimkî beşek ji civak me hîn jî li dijî pêşketina jinan heye. Ji bo vê yekê bang li keç û jinên ciwan dikim ku ji hêz û keda xwe bawer bin û derfetê nede mirovê xwedî zihniyeta baviksalarî.”

**‘Karê derve ji bo jinan ne şerme’**

Berîya Hesen jî ku ev çar heyvin li dikana firotina cilên zaroka de kar dike balkişand ser nerazîbûna malbata wê ji kar re û wiha got: “Destpêka ku min behsa kar ji malbata xwe re kir, ji min re gotin na û şerme ku tu li bazara kar bikî. Lewra bi hezarê salaye jin tenê bi karê malê girê dana. Lê nerîna min cuda bû. Bi destpêkirina min re ji kar re min hişt nerîna malbatê were guhertin, lewra wan jî dît ku piraniya dukanên bazarê jin in.”



Berîya diyar kir ku ew bi karê xwe pêdiviyên jiyana malbatê pêk tîne, çimkî ya herî mezin di nava xwişk û bireyên wê de ew e. Herwiha Bavê Berîya beriya demekê ji ber nexweşiya penceşêrê jiyana xwe ji dest da.

Berîya Hesen wiha axaftina xwe bidawî kir: “Bi derketina fikir û felsefeya Rêberê Apo pergala yek dest pêş ket û ya baviksalarê hat hilweşandin. Mirov dikare bêje silogana Rêber Apo “jin, jiyan, azadî” digihişe wê heqîqeta xwe. Rêber Apo tehlîlkirin ango jineolojî û dîroka jinê, derxistiye li ser rûyê cihanê.”

## Ji Pênûsa Jin

### Ez jin im

**Nehîr Pale**

Peyveke ku sîstema baviksalarî devkî û nivîskî ji kokê rakiriye. Di pirtûkên olî, wêje, kevneşopî û hunerê de şopa wê nemaye. Peyva ez jin im hebûna jinê diyar dike. Mêr bi hemû rêbazên ku li hemberî jinê dide meşandin destûr nade ku ev peyv were bikar anîn. Pênaseya koletiyê li jinê kirin û wê li bazaran dayîna firotin û li gorî fîzîk û temenê jinê buhabûna wê diyar kirin û qirkirine. Qirkirina li hemberî jinê tê meşandin dibe sedema ku jin tu carî xwe weke jin pênase neke, zêdetir weke dayîk, xwişk, keç û hevjîn dide naskirin. Jin hem fedî dikin bibêjin ez jin im û dizanin dema xwe wisa pênase bikin, wê êrîş li ser wan çêbibin.

Mêr hemû hewldanan dikin ku bighîjin asta bibêjin ez mêr im. Eger lawikekî temenê wî 2 sale ji dayîka xwe re dibêje:` Pere bide min ji bo ez bibim mêr` wê demê bi giştî mêr mêrbuyînê ji xwe re çareserî dibînin û serbilind in. Civaka cinsiyetparêz ji xwe gelekî nirx daye vê pênaseyê, mêrbûyîn kirine pîvanê camêrtî, hêz û wêrektî. Jinbuyîn jî lewazî û pirsgirêk didin naskirin. Gotina bav û kalan a ku dibêjin `Xema qîzikan heyanî mirinê` vê hişmendiyê diyar dike. Nirxekî mezin ji bo mêr tê dîtin û her tim zextê li ser jinê dikin ku ew lawaze û nikare xwe biparêz e. Jina bi kêrî xwe were, zexta civaka cinsiyetparêz qebûlneke wê reş dikin û jina teqlîdê mêr bike pesna wê didin. Ev feraset û nêzîkatî hemû dibin sedema ku peyva ez jin im bê qîmet bibe û jin jê şerm bikin.

Kîjan jin dibêje Ez jin im? Jina ku raman û fikrê Rêber APO ji xwe re çareserî dibîne, ev jin wê dest bi têkoşîn û berxwedana li hemberî cinsiyetparêziya civakî bikin.

Jina li ser kevneşopiyan dimeşe ew ê nikaribe bibêje ez jin im û nafikire ku çiqasî nirxê vê gotinê heye û tê çi wateyê. Jina vekirî nasnameya xwe bi gotinê bide nasîn wê her tiştî bide ber çavên xwe. Ev gotin di ferhenga civakê de nîne, naxwaze bibhîze yan jî kesek bide bikar anîn. Pênaseya Ez jin im, jin, jiyan, azadî felsefe, çand û exlaqê avakirina civaka demokratîk û gihîştina sosyalîzmê ye.

Tevgera jin ji destpêka salên heftê ji Bakurê Kurdistanê dest bi têkoşînê kir û niha jî li ser asta cîhanî xwe birêxistin dike. Tevlîbûna têkoşînê, artêş û tevger avakirin rêbazên têkoşîna li hemberî cinsiyetparêziyê ne. Ji bo jin xwe nasbikin, ji xwe şerm nekin, xwe birêxistin bikin û êdî bikarbin bibêjin em jin in bi sedan jin canê xwe feda kirin. Şehîd Bêrîtan (Gulnaz Karataş), şehîd Zîlan (Zeyneb Kinacî) pêşengtiya vê têkoşîn û berxwedanê kirin û di şoreşa Rojava de jî şehîd Roksan, Rêvan, Avesta û bi sedan şehîdên jin berdewam kirin.

Ji bo jinê buyîna şervan, şoreşger û têkoşer dibe bingehê li nasnameya xwe vegere û bibêje ez jin im. Jina bibêje ez jin im tê wateya ku biryara têkoşînê da ye, ew zayendperestiyê ji xwe re çarenûs nabîne û dest bi têkoşînê dike.



# Konferansa yekîtiyê ji hunermendan re bû cihê hêviyê

Her çiqasî dereng jî ket, lê banga hunermendan a bi civakê re ya ji bo yekîtiya gelê Kurd bi cih hat. Hunermend Roj Elî diyar kir ku dijminê gelê Kurd ji bo li cîhanê Kurdan tune bikin, di Rohjilata Navîn de gelek planên qirêj pêk anîn, yek jê avakirina DAIŞ`ê bû.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Ji ber ku di civakê de rola hunermendan girîng û bi bandor e, sala 2020‘an li Ewropayê, ji her çar perçeyên Kurdistan, hunermendên Kurd li hev civiyabûn û benga yekîtiyê kiribûn. Lidarxistina “Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê” ji hunermendan re bû cihê kêfxweşiyê.

Derbarê mijarê de hunermend Roj Elî ji rojnameya me re axivî.

**‘Qelenê azadiyê her dem xwîn e’**

Hunermend Roj Elî wiha axaftina xwe berdewam kir: “Mixabin li Rojhilata Navî ji bo tunekirina gelê Kurd û wendarikrina çanda wê ya bi hezarê salan, gelek planên qirêj hatin pêkanîn. Yek jê ya ku ne tenê bandor li gelê me kir herwiha li seranserê cîhanê xetereya xwe belav kir, DAIŞ`ê bû. Lê ji ber ku gelê me gelekî berxwedêre, bi hezaran keç û xortên me ji bo têkbirina plana DAIŞ`ê cane xwe feda kirin. Çimkî her dem qelenê azadiyê xwîn e. Ji bo parastina nasname, çand, ziman û xwîna şehîdan, bi sala ye Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, banga lidarxistina kongreyekî neteweyî dike, ne tenê li çar perçeyên Kurdisatnê, yekîtiya gel li seransê cîhan pêwîst dibîne.”

**‘Rola mezin ya di yekîtî û yekhewleta Kurdî de banga Rêber Apo bû’**

Herwiha li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ya “Aştî û Civaka Demokratîk” Roj Elî bal kişand ser bandora bangê li tevahiya cînahê û wiha got; “Banga Rêber Apo ji bo lidarxistina kongreyekî netewî de rewşeke wiha hesas de, pir girîn û bi bandor bû. Lewra eger gel û partiyê me ne yek be, wê welatên mezin yê mîna Emerîka û Yekîtiya Ewropaya jî bi cidî nêzî çareserkirina pirsgirêka Kurdî nabe. Ji bo vê jî di yekîtiyê û yekhelwesta Kurdî de, banga Rêber Apo roleke mezin lîst.”

**`Hunermend perçeyek ji giyanê civakê ye`**

Li ser rol û bandora hunermenda ya ser civakê û cîhanê bi giştî, Elî got, di hemû welatan de saziyên herî girîn û bi bandor saziyê hunerê ne. Lewra hunermend bi deng û awazên xwe çand û dîroka civaka xwe ji cîhanê re dide diyar kirin. Elî wiha li axaftina xwe zêde kir: “Hunermendên ku ji civaka xwe hez bike û naxwaze çanda wê wende bibe, ji bo xizmeta civaka xwe kar dike û di rêya deng û awazên xweşî û nexweşiya gelê xwe tîne ziman. Di Şoreşa Rojava de jî ev yek hat diyarkirin, hunermendan bi dengê xwe şervanan bi çekên xwe şorşa xwe biser dixin.”

**`Dîroka Kurdan dewlementir bû`**



Hunermend Roj Elî di dawiya axaftina xwe de “Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê” li hemû gelê Kurd bi taybetî li malbatê şehîdan pîroz kir û wiha got; “Ji destpêka Şoreşa 19`ê Tîrmehê û heta roja îro hemû tiştê ku hatine bidestxistin, xwestekên gelê Kurd yê bi sala ye, ev jî bi saya xwîna keç û xortên gel e. Bila dijmin vê yekê baş zanibe ku êdî gelê Kurd bi taybetî gelê Rojava piştî van destketeyan, dîroka wan dewlemendtir bûye û wê ti hêz nikaribe wan tine bike.”

# Ji çiraxên wêjeya kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvan Mizgîn Hesko Helbestvana afirandêr, xwedana peyvên nazik û hesteke xweş, ji bo afirandêriyê sernavê bedewî û xweşikbûnê xêz dike, xwedana jêhatîbûneke bêhempa ku tiştan bi awayekî afirîner û balkêş derdixe pêş ku peyvên xwe dike çiraxên ronahî pê tariya şevan ronî dike. Karîbû bi tîpên xwe yên bedew gelek wateyên xweş derxe û ev yeke dihêle ku karê wê ji yên din cuda be û herwiha meqamê wê cuda dike ji yên din, ew yek ji kesayetiyên wêjeyî û çandî yên afirîner ên kêm tê hesibandin ku bi çalakbûn û jêhatiya xwe karîbû her kesî matmayî bihêle di bidestxistina serkeftinên mezin de, bi belavkirina ruhê afirandêrî û jêhatîbûnê di her tiştê ku dike de, di hûnandina helbestên bedew ên bi evîn û hêviyê çêdike û bi nameyên xwe yên xweş û nivîsên xwe yên hêja giyan bi bedewî û xweşikbûnê tijî dike.

Helbestvan Mizgîn Hesko yek ji helbestvanên Kurd ên hemdem û neteweyî ye ku bi dil û can parastina mîrateya wêjeyî û hunerî, nasnameya netewe û mîrata wê ya çandî û şaristanî dike û herwiha gel teşwîqê berdewam kirina têkoşîn û xebatê dike ji bo bidestxistina mafên xwe yên rewa. Helbestvan Mezgîn Hesko di 20’ê Mijdara sala 1973’an de li gundê Şelhûmiye yê girêdayî navçeya Tirbespiyê li Rojavayê Kurdistanê ji dayîk bûye, dibistana seretayî, navîn û lîse li bajarê Tirbespiyê xwendiye.



Ji sala 1996’ê heta niha bi malbata xwe re li Almanya dijî û dayîka sê zarokan e, dîplomaya kulîlksaziyê ji Almanyayê wergirtiye, ji zarokatiya xwe ve, di bin bandora mîrata çanda kurdî de maye û muzîk û şêwaza stranbêjiyê ya klasîk bandorek mezin li ser wê kiriye. Wê di sala 1988’an de dest bi nivîsandina helbestê bi zimanê kurdî kiriye. Xanim Mezgîn endama Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê ye û endama desteya nivîsandî ya kovara Pênûsa Nû ya bi zimanê kurdî ye, helbestvan Mizgîn wê gelek caran xelatên rêzgirtinê wergirtine:

1- Xelata Rûmetê ya Helbestvan Cegerxwîn 2012, Hanover.
2- Xelata Festîvala Helbesta Kurdî 2013, Esenê.
3- Xelata Rûdoz
4-Di dawiyê de xelata helbestvan Seydayê Tîrêj ya dewreya yekem wergirt, ya ku li bajarê Esenê ji aliyê komeleya sîwana kurdî ve hat lidarxistin, ji ber xebatên wê yên hêja di warê wêje û helbesta kurdî de.

Helbestvan Mizgîn Hesko di nêzîkê sih sal û nîv ji nivîsandinê karîbû 15 pirtûkan bi weşîne ku hemû bi zimanê kurdî ne û di navbera helbest, Roman û vegotinê de ne, bi riya wan karîbû balê bikşîne ser xwe ku di warê hunerî û nivîsandinê de xwedî jêhatîbûneke kûr e.

Bi tîpên zêrîn karîbû navê xwe binivîsîne di nav jin û mêrên afirîner de, li cîhanê û li Kurdistanê de, di rêya nivîsên xwe yên ku di warên helbest û pexşanê de dinivîse bi zimanekî wêjeyî û derbirînî yê hêja ku gotinên xwe bi xwezayê re tevlihev dike, ku ji wan hemû wateyên bedewiyê ji kulîlk û rîhanan, ji keriyên xezalan distîne û wan vediguherîne tabloyên hunerî yên peyvên herî şêrîn û wêneyên herî xweşik ên bedewî û balkêşiyê, ji bilî hûnandina helbestê, gotaran dinivîse û gelek babet û lêkolînên wê li ser qada jin û romanê hene.

Gelek helbest, nivîs û gotarên wê di piraniya malper, rojname û kovarên kurdî de hatin weşandin.

Ji berhemên Mizgîn Hesko yên wêjeyî yên ku hatîn çapkirin evin:

1-Tîpên Evînê- (Helbest) Avdara 2007 .
2- Asoyekî tijî “Endeko”, Tîrmeha 2008.(Helbest).
3- Di nav henasên kovanan de, Avdara, 2010. (Helbest).
4-Li ber pala Welatekî birîndar diherikîm-(Helbest).
Çapa yekemîn 2012an.
Çapa duyemîn 2020.
5- Ristek Lale ( helbestên dema seretayî ). Êlûn 2013an.
6- “Ber bi Werzên Hezkirin ê ve”, (Helbest) .Mijdar- 2015.
7-Rêgehên Keskîn, (Helbest). Gulan 2019” .
8- Ji boxçika jiyanê (Rojnivîs - Raman -Nêrîn û Dîtin).Mijdar 2020.
9-Nexşeya Rewanê Bêdengiyê -(Helbest )
Çapa yekemîn- Avdara 2021.
Çapa duyemîn- 2022
10- Surperiya Zîvê Sihirdar - (Helbest).
Çapa yekemîn Avdar 2022
Çapa duyemîn -Havîna 2023.
11-Ji Ferhenga lêgeriyanê (Nêrîn û Raman). 2022.

Helbestvan û nivîskar Mizgîn Hesko di vê dema dawî de du dîwanên helbestan bi zimanê kurdî çapkirin :

1-Bişkojên Bi Roniyê mest (Helbest). Havîna 2023.
2-Xalxalokên Di Piyalên Gulanê de -(Helbest). Êlûn 2024.

Herwiha di sala 2024’an e du pirtûkên din jî bi zimanê Kurdî wê çapkirin:

1-Jin û Pirsa wêjeyê- (Gotar), Sibat 2024.
3- Ji Ristezara Elindê (Rojnivîs - Raman -Nêrîn û Dîtin).Tîrmeha 2024.

Herwiha çend berhemên wê yên edebî yên neçapkirî jî hene, ji wan:

1- Sebata Şekir - helbestên zarokan
2- Hirçê qeşayê ber bi kû ve, Çîrokeke Zarokan a ji Almanî hatiye wergerandin.
3- Salamanderê reşik ,( roman).
4- Rivdek ji helbestên nû
5- Hemû gotarên min

Helbestvan Mizgîn Hesko dê bimîne stêrkek geş her şewqa wê li esmanê Kurdistanê biçirise û rêya azadiyê ji nifşên paşerojê re ronî bike. Ji wê re saxî, silametî û temenekî dirêj, serkeftinek domdar û pêşketinek berdewam dixwazim. Bila diwêta pênûsa wê ya zêrîn ku bêhna kulîlkan û nektarê gulan belav dike ji bo afirînerî û jêhatîbûna di jiyan û mayîndeyê de bimîne.

## Têbînî



### Wêjevan hîna li benda desthilatê ne ku rol û berpirsyariya wan diyar bike

**Kemal Necim**

Rewşenbîr û wêjevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji destpêka vê hefteyê ve mijareke girîng di nava xwe de gotûbêj dikin û çend pirsên bi kêşe û arîşe danîn ser maseya qada wêjeyê li Sûriyeyê.

Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê îsal çalakiyên Hefteya Wêjeyî li bajarê Hesekê li dar xist. Di du rojên pêşî yên hefteyê de mijara diyaloga çandî û rola wêjeyê di jinûveavakirina dîmena çandî li Sûriyeyê bi semînerekê û panelekê hate gotûbêjkirin. Di bin vê sernava giştî de gelek sernavên hûr jî berz bûn, weke ka piştî salên dirêj ên çewisandin û pişaftinê dê wêje karibe wan birîn û derzên ku rejîma desthiladar di giyan û wijdana civakê de kolane bipêçe û derman bike û rewş û dîmeneke nû ava bike.

Di naverok û nirxandinên du rojan de pir diyar bû ku rewşenbîr û nivîskarên Sûriyeyê bi taybet yên Kurd hîn jî di bin bandor û azara salên qedexe û çewisandin û parçebûnê de ne, weke girtiyekî di binê zindanê de ku ji nişka ve azad bibe û hîn bawer nake ku êdî ew ne li zindanê ye. Lewma piraniya kesên ku nirxandin kirin xwestin bêjin ku wî pir derdê zilm û zordariyê kişandiye û di bin barê vê boçûnê de bi awayekî nerim xwe ji bin barê berpirsyariyê dide alî.

Li aliyekî din, wilo diyar dibû ku rewşenbîr û nivîskarên Sûriyeyê li şûna ku li rola xwe bigerin, li bendê ne ku rêjîmek yan desthilatdareke nû were, ji ya berê hinekî nermtir be, vekirîtir be û ji wan re bêje fermo va ev rol û berpirsyariya we ye. Anku ew digere ku desthilatdar jê re li rol, erk û delametên wî bigerin. Lewma di gotûbêjan de pir kesan dîse gazin û lome ji desthilatên nû dikirin, lê gazin û lome ji xwe nekirin.

Pir diyar e ku rejîma desthilatdar ya berê birînên kûr di laşê civakê de çêkirin û civak ji hev tarûmar kirî ye. Ev tişt ji bo civaka derbirîn, raman, afrêneriya wêjeyî û hunerî jî rast e. Li gorî vê yekî xuyaye ku amadekarên vê çalakiyê dema ku ev sernivîs û mijar avêtin ser maseya gotûbêjê xwestin ji nivîskar û wêjevanan re bêjim ku wêje û derbirîna wêjeyî bi awayekî ji awayan dikare ew hilweşîn û derz û parçebûna ku di laşê civakê de hatiye çêkirin sererast bike, ji nû ve ava bike û li şûa wê nirxên nû yên hevnaskirinê, hevpejirandinê, hezkirin û jiyana hevbeş ava bike. Lê ev yek dê çawa bibe?

Pêşî divê wêjevan li xwe mukir were ku ew rastî hewleke mezin ya hilweşandina giyan û wicdanê hatiye, lewma pêşî divê xwe ji wê hilweşînê azad bike, êdî bes bi tepan li xwe bixe û bêje ne sûcê min bû, sûcê desthilatdaran bû. Piştî wê yekî divê bawer bike ku wêje dikare xerabûn û hilweşîn û derz û birînan derman bike, bipêçe û ji nû ve ava bike. Piştî ku bû xwediy wê baweriyê êdî divê li alavên xwe bigere, alavên derbirîn û afrêneriya wêjeyî ku karibe di laş û giyanê civakê de nirxên bedewî, lihevkirin, hevdûpejirandin û hezkirinê ava bike.

# ‘Bi saya Rêveberiya Xweser Civaka Êzidî ji komkujiyan rizgar bû’

Rêvebera Ofîsa Civaka Êzidî ya Sûriyê Sûad Hiso diyar kir ku hejimara Êzidiyên di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de berî şoreşê bi hezara bûn, lê ji ber rewşa şer gelek Êzidî koçberî derveyî herêmê bûn û îro bi saya Rêveberiya Xweser civaka Êzidî ji komkujiyan rizgar bû.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Dîroka gelê Kurdistanê û tevayiya civakên Rojhilata Navî di civaka Êzîdî de vaşartî ye. Ev civak bi bawerî, jiyan, dîrok, çand û hebûna xwe xwediya bîra herî kevnar ya mirovayiyê ye. Ji ber van taybetmendiyên xwe, ji bo desthilatdaran, bi taybetî dewletên dagîrker her tim wek civaka herî metirsîdar hatiye dîtin. Ji bo qirkirina vê civakê bi dehan ferman li dijî wan hatine meşandin. Jimareke mezin ji Êzdiyên Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî piştî destpêkirina aloziya Sûriyê berê xwe dan Ewropa yê. Gelê kurd bi giştî û bi taybet civaka Êzidî di şoreşa Rojava de pêşengtî kir û ji tevahiya gelên herêmê re bû mînaka berxwedan û têkoşînê.

Di derbarê hebûna Êzidiyan di Bakur û Rojhlatê Sûriyê de Rêvebera Ofîsa Civaka Êzîdî ya Sûriyê Sûad Hiso ji Rojnameya me re axivî.



### Dîrok û baweriyên Êzidiyan

Sûad Hiso anî ziman ku dîroka derketina civaka Êzîd li ser rûyê erdê ne diyar e û wiha got: “Dema ku erd hate avakirin civaka Êzîdî jî hate avakirin, herwiha dîroka derketina civaka êzîdî li ser rûyê erdê ne diyar. Baweriya me bi hebûna yek xwedayî tê. Rehkûrbûn û koka ola me dighîje heya 2000 salî berî çêbûna hz Îsa. Ola Êzidatiyê ne weke olên Rojhilata Navîn yên mîna cihûtiyê, mesihîtiyê û îslamê ye, bi yekcarê re peyda bûye, guhertin, pêşketin pêre çêbûye, di destpêkê de me her çar elêmentên jiyanê, ax, av, ba û agir diparastin e.”

### ‘Armanca dagirkeriyê ku civaka Êzîdî tune bike’

Sûad Hiso da zanîn ku hejimara Êzdiyan di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de berî şoreşê bi sed hezaran bûn û wiha berdewam kir: “Piraniya Êzîdiyan li kantona Efrînê cih digirtin û hejmara wan 35 hezar kes bûn û di 23 gundan de jiyan dikirin, herwiha dema ku şerê Efrînê çêbû piraniya Êzidiyan koçberî derveyî herêmê bûn. Lê bi hatine DAIŞ’ê civaka Êzidî koçber bûn û bi taybet li Şengalê, herwiha niha di vê demê de hejimara Êzîdiyan di Sûriyê nagihêje 5 hezar keseyî. Ev şerê ku li herêmê çêdibûn bi taybet civaka Êzîdî dibû hedef, armanca wan ku civaka Êzîdî qirbikin û tune bikin. Dema ku DAIŞ’ê derbasî bajarê Efrînê bû yekser derbasî gundê Êzîdiyan bûn û bi aweyekî hovane Êzid qetil kirin. Ji ber vê yekê ÊzIdî ji bo ku xwe biparêzin koçberî derveyî welat bûn, weke Almaniya, Belcîka û hwd.”

### ‘Bi saya Rêveberiya Xweser biratiya gelan hate avakirin’

Sûad Hiso eşker kir ku dema ku Rêveberiya Xweser hate ragihandin Civaka Êzîdî xwe birêxistin kir û wiha pê de çû: “Dema ku Rêverberiya Xweser hate avakirin Civaka Êzîdê xwe birêxistinkirin û



navendên xwe li tevahiya herêmê vekirin, di her sazîyekê û navendekê de hebûna Êzîdiyan çêbû. Rêjîma Baas tu maf ne dida me lê bi saye Rêveberiya Xweser em gihiştine mafê xwe û ji qetilhaman rizgarbûn, bi riya biratiya gelan, pirojeya Rêber Apo pêkhateyên herêmê bi hev re jiyan dikin. Em di Bakur û Rojhilata Sûriyê de rastî gelek êrişan hatin û yên ku me parastin rêveberiya Xwesere bû, herwiha niha ne ji Rêveberiya Xweser bane em hatbûn qirkirin û wundakirin, hemberî vê yekê berdêlên pir giran buha hatin dayîn û em ê heta dawiyê li ser şopa şehîdên xwe berxwedaniyê berdewambikin.”

### ‘Pêwîst e civaka Êzîdî asta rêxistbûna xwe bike’

Rêvebera Ofîsa Civaka Êzîdî ya Sûriyê Sûad Hiso axaftina xwe wiha bi dawî kir: “ Rêber Apo gelek caran name ji bo Civaka Êzîdî rêkirine û di sala 2013`an de nameyek ji bo me şiyandin û di nameyê de got civaka Êzîdî biparêzin, herwiha 2025’an de jî nameyek ji me rêkir û got ez jina Êzîd silav dikim û Rêber Apo bi riya vê nameya xwe hêzeke mezin da me. Banga min Civaka Êzîdî re heye ku hîn asta rêxistbûna xwe xurtbikin, li kêleka hêza xwe bisekinin û pêwîst e em xwe bighînin tevahiya jinên Êzîdî û tola jinên Êzîdî rakin.”

# Bere Beyt; Yek ji kevintirîn gundên Xiristyanan li Rojavayê Kurdistanê

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Gundê Bere Beytê yê girêdayî bajarê Dêrikê, yek ji kevintirîn gundên xiristyanan yên li Rojavayê Kurdistanê ye, dîroka avabûna gund jî vedgere beriya hezar û 500 salî û dêreke kevnar tê de heye.**

Yek ji kevintirîn gundên xiristyanan li Rojavayê Kurdistanê gundê Bere Beytê yê girêdayî bajarê Dêrikê ye. Destpêkê navê gund Bar Bêto bû ku tê wateya (Lawê malê). Di vî gundî de 30 mal hebûn, lê niha tenê 5 mal di gund de mane. Di dema berê de gelek kes di vî gundî de dijiyan, çi aşûr, kildan, ermen û Siryan. Lê bi sedema kirîz û aloziyên ku derketin her kesî berê xwe da welatekî. Tenê 30 mal man di gund de, lê bi demê re rewşa Sûrî jî nexweş bû û dagirkeriya Tirk êrîşên wê berdewam bûn lewma wan jî bar kir. Hin malan berê xwe dan bajarê Dêrikê û hinên din jî ber bi welatên derve ve çûn.

Di gund de dêrek heye ev kevintirîn dêre ku her sal di cejna Bereketa Genim de, her kes tên serlêdana Dêrê dikin û kesên xiristiyanî tên rê û resmên xwe di dêrê de çêdikin. Di sala 1958’an de dêr hat çaksazkirin û nûkirin, ev dêr li cem her kesî pîroz e, ji ber ku çi kesê ku xwedî hêviyekî be berê xwe dide vê dêrê û dûa dike. Çi kesên nexweş be yan jî kesên ku dixwazin zarokên wan jî çêbibin, ji bo pêkanîna hêviyên xwe berê xwe dide vê dêrê. Navê Dêrê Meryem



Elezrai 15’ê meha Gulanê cejna şehredêra Berbîtê ye ev cejna Meryem Elezra ye ji bo bereketa Çandiniyê ye, hemû older ji bajarê Qamişlo berê xwe didin vê dêrê. Temenê vê dêrê hezar û 800 sale piraniya kesên ku berê xwe didin vê dêrê kurd in. Di heman demê de avahiyek di gund de jî heye ev avahî xwe bexiş hatiye avakirin, kesê ku tê sardana gund dike dikare li wir bi cih bibe.

### Jiyana gund

Kesê ku di gund de mayne jî bi karê çandiniyê ve mijûl dibin, di dema berê de di gund de çem hebûn ji çar aliya ve av derbasî gund dibû, lewma ev gund navdar bû bi çandiniya Birinc, kuncî, nok, genim û kizbera. Di heman demê de gund navdar bû bi bi hemû çûreyên darên fêkiyan. Lê ji ber kêmbûna baranê û qutkirina dagirkeriya Tirk ji avê re ev çem û kanî çikan û rewşa gund ber bi xirabiyê ve çû û gundî bi rewşeke xirab debara jiyana xwe dikin. Di dema berê de dibistan hebû lê niha zarok di gund de nînin, ev malên ku di gund de mayîn jî bi zimanê kurdî diaxivin. Lê malê ku niha di gund de mayîn dev ji gund bernedan ji ber ku gund wek amanetekî di sitûyê xwe de didîtin. Niha ew gund û zeviyên xwe diparêzin di heman demê de pêşwaziya mêvanên ku tên sardana gund dikin.



# 6’ê Gulanê; Ne hewla yekem a armanckirina Rêbertî bû

Hewildanên dijmin ji bo hedefgirtina Rêber Apo ji destpêka Tevgera Azdiyê ve didomin. Di 6’ê Gulana 1996’an de bi destê gladiyoya NATO’yê ku DYA serkêşiya wê dikir li Şamê li dijî Rêber Apo armanckirina bombeyî pêk hat. Bi vê êrişê re bingeha komploya navdewletî ya 9’ê Cotmeha 1998’an dan destpêkirin.

**Zana Roj/Qamişlo**

Piştî pêvajoya agirbesta destpêkê ya ne serketî ya sala 1993’an û du salên ji şerê giran ê li Kurdistanê, dawiya sala 1995’an rayedarên dewleta Tirk bi rêya hin navbeynkaran daxwaza agirbestê ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kirin. Tirkiyeyê xwe ji bo hilbijartinên giştî yên 24’ê Kanûnê re amade dikir. Siyaseta Tirk a bi serkêşiya Çîller, Yilmaz, Ecevît û Erbakan, di rojên herî tevlîhev ên dîroka xwe de bû. Rêber Abdullah Ocalan ji bo pêşî li pêvajoyeke nû vebike di 15’ê Kanûna 1995’an de bi telefonê ji MED TV re axivî û agirbest ragihand.


Piştî hilbijartinên li Tirkiyeyê û Bakurê Kurdistanê di rojên destpêkê yên sala 1996’an de rejîma Enqereyê bi komkujiyekê bersiv da ragihandina agirbestê. Tê de 11 kesên kurd jiyana xwe ji dest dan û hewildan ku vê komkujiyê bixin stûyê Tevgera Azadiyê PKK’ê. Lê tevî van gefan jî PKK’ê agirbest berdewam kir.

Bêguman bersiva dewleta Tirk a li agirbestê ne tenê bi vî rengî bû. Li aliyekî di zivistana 1996’an de li Kurdistanê şer hate girankirin û ji bo tunekirina fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan yekîneyên kontrgerîla hatin bikaranîn. Di rojên destpêkê yên mehên biharê de ji bo sûîqesta li dijî Rêber Abdullah Ocalan ku hingî li Şamê bû, ji ‘Serokê Daîreya Operasyonê’ ya MÎT’ê Mehmet Eymur re ferman hate dayîn.

Plana ku ji aliyê MÎT’ê ve hate amadekirin ji aliyê Wezîrê Karên Hundir, Serokwezîr û Serokkomar ve hate pejirandin. Ji budçeya veşartî jî 25 milyon dolar pere hate veqetandin. Navê ‘Operasyona Mercedesê’ li planê hate kirin. Ji ber ku li gorî planê wesayiteke Mercedes a bombebarkirî wê li ber mala ku dihate texmînkirin Rêberê Gelê Kurd lê ye, bihata teqandin. Eymur ji bo vê jî tetîkkêşê JÎTEM’ê Mahmût Yildirim bi navê kod Yeşîl wezîfedar kir.

### Serokê Daîreya Kontrteror a MÎT’ê li gelek sûcên dewleta Tirk mikur hatibû

Eymur ku ji salên 1970’î heta dawiya salên 1990’î şefîtiya daîreya MÎT’ê kir, têkildarî êrişa bombeyî ya 6’ê Gulana 1996’an a li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji Mûrat Yetkîn re axivî bû û gotinên xwe yên di îfadeya dozgerê Ergenekonê de dubare kir: “Me tonek teqemenî wergirt. Piştî rojekê di rojnameya Cûmhûriyetê de nivîsek hate weşandin, bi gotina ‘MÎT wê vê teqemeniyê çi bike?’ Ji Serokkomar, ji siyasetmedaran me destûr stand. Bêyî destûrê Musteşarê MÎT’ê jî nikare bike. Bêyî destûrê em ê çawa karibin bikin? Serokê Fermandariya Giştî û Serokkomar ji xwe pejirandibûn. Me pêşkêşiya wê kir. Me agahiyên li ber destê xwe pêşkêş kiribûn. Pêşkêşiyeke baş bû. Me qala kar kir. Gotin,





temam. Me dewam kir. Yeşîl hebû. Her wiha kesên leşker hebûn. Wezîfedarên fermî hebûn ku me ji wir re şandin û bi veşartî çûn. Ya esasî nikare bê gotin ku ev hewldan bi ser neket. Me nekarî Apo bikujin, lê belê me teqîneke welê mezin kir ku Sûriye tirsiya.”

### Rêber Abdullah Ocalan piştî pêkanîna êrişa 6’ê Gulanê gelek caran ew bûyer di hemû aliyan de nirxandiye û armanca ji wê yekê aniya ziman

Rêber Apo di hevdîtina bi parêzeran re ya di 31’ê kanûna 2003’yan de têkildarî êrişê wiha dibêje: “Dozger bila van gotinên min weke îxbarekê qebûl bike û lêkolînê bike. Çatli, Bucak û Şaredarê Wêranşarê yê berê 50 milyon dolar standin. Îstîxbarata Sûriyeyê pere xwar. Wan kontrol kir. Mînîbus li ber derî, li nav zeviyeke vala teqandin. Di heman kêliyê de agahî li Washington û Londonê deng veda. Çaleke bi qasî 10 metreyan vebû. Di esasê xwe de ez li wir rizgar nebûm. Çîller digot; ‘Mesût Yilmaz îxbar kiriye.’ Mesût Yilmaz jî digot; ‘min nekiriye.’ Bila dozgerî kirina Çatli û Bucak weke îxbarekê qebûl bike. Di nava dewletê de tenê ji bo bombeyekê 50 milyon dolaran xerc dikin. Ev pereye jî ji lêçûnên veşarî pêşwazî kirin. Di bûyera Selçûk Parsdan de ev çîroke derketibû holê. Dizîkeran pere wiha birin. Heke tenê li dijî min 10 suîqest hatibin kirin, ev bi qasî yek-du milyar dolar dike. Vaye dewlet wiha têkbirin.”

Rêber Apo da zanîn ku piştî serdema 1993’yan vala hatî derxistin, ji hêla madî û manewî ve gelek êş hatine kişandin, bi hezaran cînayetên kiryarnediyar hatine kirin. Rêber Apo di hevdîtina xwe ya 4’ê adara 2009’an de têkildarî mijarê wiha dibêje: “Heta ev serdem neyê ronîkirin û faîlên wan neyên darizandin dê aştiyeke mayînde çênebe. Lewma min her tim got bila Komîsyona Lêkolînkirina Heqîqetan û Lihevanînê bê avakirin. Bila rewşenbîrên xwedî namûs û rûmet hewl bidin vê komîsyonê ava bikin. Bila tevahiya agahiyên têkildarî vê serdemê berhev bikin. Bila hemû agahî û belgeyan kom bikin. Bila ev komîsyon nûçeyên di rojnameyan de derketin jî berhev bikin. Bila amadekariyan bikin û arşîvê çêbikin. Dema şert û merc guncav bûn jî bila pêşkeş bikin. Qismekî faîlên van sûcan tên darizandin. Lê hinek jê hêj nehatine darizandin. Dema Komîsyona Lêkolînkirina Heqîqetan û Lihevanînê hate avakirin, divê her kes çi dizane vebêje. Divê Çîller ji bo vê komîsyonê biaxive. Divê Eymûr ji bo vê komîsyonê biaxive.

### Hewildanên hedefgirtina Rêber Apo yên beriya 1999’an

Divê em ji bîr nekin ku ji dema destpêkirina Rêber Abdullah Ocalan bi doza azadiya gelê Kurd û Kurdistan, Rêbertî beriya Komploya Navnetewî a 1999’an gelek caran bi hewildanên cur be cur kete hedefa dijim.

Hewldana destpêkê a armancgirtinê ya cidî, çend roj beriya damezrandina PKK’ê pêk hat. 18’ê Gulana 1978’an ji bo birêxistinkirina berxwedana piştî qetilkirina ji kadroyên pêşeng ên li Hîlwanê Halîl Çavgûn, Abdullah Ocalan çû Rihayê. Dema ku bi wesayiteke zer ji Hîlwanê diçû Hoşînê êriş lê hate kirin. Gule li wesayitê hate reşandin, bi şensê Rêberê Gelê Kurd bêyî birîndar bibe rizgar bû. Di nava 20 salên li Rojhilata Navîn de jî gelek caran êriş lê hatin kirin.

### Hilbijartina rojê ne tesedûf bû

Tîma suîkastê ya dewleta Tirk ku li Şamê ji zû de haziriya êrîşa bombeyî dikrin 6’ê Gulana 1996’an tevgeriyan. Ne bi tesadûfî ev roj hilbijartin. Lîderên tevgera şoreşa Tirkiyê Deniz Gezmiş, Yusuf Aslan û Huseyîn Înan 6’ê Gulana 1972’an hatibû darvekirin.

# Rojava û pêvajoya nû

**Cîger Efrîn**

Rêber Apo di 27.2.2025'an de banga “aştî û civaka demokratîk“ kir. Bê guman banga Rêber Apo bangeke dîrokî ye û wekî hemû bang û daxuyanîyên Rêber Apo wê banga “aştî û civaka demokratîk“ jî cihê xwe di dîroka wêjeya sîyaseta civakî ya cîhanê de girt.

Di bingehê de banga Rêber Apo, bi armanca parastina destkeftîyên şoreşa Kurdistan'ê, mûdexeleya pêvajoya ku li Surî û Rojhilata Navîn tê jînkirin e.

Li Rojhilata Navîn Filistîn'ê Hemas hema bêje ji holê hate rakirin, li Libnan'ê jî Hizbulah derbeya mirinê xwar. Di encama şikandina baskên İran'ê li Surî rejîma BAAS'ê di nava çend rojan de hilweşîya û İsraîl-İngiltere rê ji HTŞ, ya ku di hembêza Tirkîyê de xwedî dikirin, vekirin û di 11 rojan de ew gihandin Şam'ê.

Ji lewra divê em wekî Kurd û pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûrî dijîn vê rastîyê baş bibînin û di hemû gavên ku em diavêjin de jî wê rastîya HTŞ'ê ji bîr nekin û li ber çavan bigirin. Kiryarên wan yên li bajarên beravê, Hema û Hums'ê û di van rojên dawî de jî li dijî Durzîyan pir vekirî raber dike ku, bi qasî serê derzîyê jî cudahî di navbera HTŞ û DAIŞ'ê de tune ye.

Di vir de ev pirs tê hişê mirov; çima bi lez û bez rêveberîya Şam'ê bi fermandarê QSD'ê Mazlûm Ebdê re di 10'ê Adarê de peymanek îmze kir? Gelo di nêzîkahîya wan ya ji Kurdan û Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûrî re guhartinek çêbûye?

Bi yek gotinê; na, tu guhartinek tune ye. Îmzekirina peymana 10'ê Adarê ji boyî ku pêdivîya wan bi rewakirinê heye hate kirin. Her wiha divê em bizanibin ku, heger hêza wan têrê kiriba, wê kiryarên ku îro li bajarên beravê û yên li dijî durzîyan têne kirin 50 qatî zêdetir li dijî pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê dijîn rû daba. Ew li benda xurtkirina xwe ne, ango li gorî wan mesele dem e û gava wexta wê hat wê pêk bînin. Ji ber ku HTŞ, DAIŞ'a ku cil guhartîye û li Şam'ê hatîye bicihkirin e.

İsraîl-İngiltere qirkirina Kurdan ku dixwestin bi komploya navdewletî (ya ku li dijî Rêber Apo lidarxistin) bikin û ji ber pêşdîtinên Rêber APO nekarîn bikin, her wiha cerbandina duyemîn DAIŞ bû û ew jî car bi tedbîrên ku Rêber Apo girtibûn û berxwedana şervanên YPG û YPJ Ivala derket. Îcar dixwazin qirkirina Kurdan û tunekirina Tevgera Azadîyê bi destê HTŞ'ê bikin. Mesele tev ev e! Serokwezîrê İsraîl û wezîrê wan yê kar û barên derva bi dehan car daxuyanîya “wê pişgirîya Kurdan bikin“dan, lê gelo çima heta niha gaveke şênber neavêtine?

Çima İngiltere hema bi lez û bez ambargo ji ser wezareta karûbarên hundirîn ya rêveberîya Şam'ê rakir?

Çima rêveberîya Trump dixwest fermandarê QSD'ê Mazlûm Abdî hema here Şam'ê û bi rêveberîya Şam'ê re hevdîtinekê çêke, peymanekê îmze bike?

Çima DYA agirbesta ku di navbera Tirkîyê û QSD'ê de hatî çêkirin, bi awayekî fermî nabe şahidê agirbestê û agirbestê ranagihîne û nabe şopdarê agirbestê?

Li vir di navbera kevanekê de vê bêjim; di dokumanên veşirtî yên İngiltere de wezareta derva ji berpirsên rojhilata navîn re dibêje;“divê hûn di hemû civînên di navbera Osmanî û Farsan de yên li ser sînor de amade bin, lê divê hûn îmzeya xwe neavêjin bin yek belgeyê û divê bi tu carî jî sînoran bi awayekî zelal dîyar nekin; herdem xeta sînor şilo be da ku em bikaribin alîyan bikişînin hêla xwe“. İngiltere bi wê sîyasetê nêzî sedsalî li ser herdû dewletan serwerîya xwe meşand. Çimkî gava bi fermî bibin şahid ji peymanekê re divê bişopînin û li gorî peymanê bimeşin. DYA jî heman sîyaseta İngiltere dimeşîne. Em di vir de kevanekê bigirin û vegerin mijara xwe.

Şerê ku îro li Sûrî û bi gelemperî li rojhilata navîn tê meşandin, şerê girtina dewleta İsraîl bin ewlekarîye ye. Îsraîl hem gelek deverên Sûrî dagir kir, hem jî artêşa Sûrî ji holê rakir. Jixwe ji sala 1974'an de jî bi derxistina şerê navxweyî dewleta Libnan'ê bêbandor kir. Sûrî mabû û ew jî bê bandor kir. Li holê xeta Rêber Apo maye û bi daxuyaniyên ku dide, hewl dide ku Tirkîyê bitirsîne. Bi tenê dayîna daxuyanîyên piştgirîyê xwedî wateyeke wiha ye. Em vê jî di sîyaseta İngiltere de dibînin. İngiltere di sala 1879-1980 de ew sîyaset li dijî îsyana Ubeydulah pêkanî. Ubeydulah name ji İngiltere, Fransa û Rusya re şandin û alîkarî xwestibû. İngiltere wekî ku wê alîkarîyê bike bi awayekî nefermî di rojnameyên xwe de radigihand. Li ser wê dewleta Elî Osman tirsîya Qibis da İngiltere, dev ji Misirê berda û Lîbya jî da Fransa. Bi kurtasî DYA û İsraîl jî heman sîyaseta İngiltere dimeşînin. Mixabin di wê sîyaseta xwd de jî serkeftîne.

Heger İsraîl ji dil ba, bêyî ku bêje bi awayên cuda dikare piştgirîya şoreşa Rojava bikira. Lê nake. Ji ber ku hêj şoreşa Rojava bi temamî ji xeta Rêber Apo derneketî. Îsraîl Kurdên ku ji wê re leşkertîyê bike dixwaze, ne Kurdên azad û Kurdên di xeta neteweya Demokratîk de têdikoşin! Rêber Apo li hemberî pêngava İsraîl înîsîyatîf girt û banga dîrokî kir. Di raya giştî de di serî de DYA, Îsraîl û İngiltere piştgirî dan banga Rêber APO. Jixwe dervayî daxuyanîyeke wiha jî nedikarin bikin. Ma qey wê rabin û bêjin; “na, şer bidomîne“.

Belê, em wekî Kurd û pêkhateyên herêmê her demê xurt û bi hêzin. Lê divê em heta Rêber Apo ji dojeha İmralî dernekeve û statuya Netewa Demokratîk neyê pejrandin qet û qet sist nebin û xwe bi daxuyanîyên xapînok nexapînin. Divê em xwe ji şerekî mezin re amede bikin. Her wiha ji boyî ku îxanet pişta me neşikîne jî divê em di xeta Rêber Apo de ji her dmê bêtir xwe birêxistin û kûr bikin.

Bi kurt û kurmancî; ne dûre ku di demeke nêz de HTŞ êrîşî Rojava bike. Ji lewra hêj şerekî pir dijwar li pêşîya me ye û heger em xwe di felsefa Rêber Apo de kûr bikin, îsrar bikin û hemû derîyan ji xayînan re bigirin, em ê zûtir bigihên hemû mafên xwe yên netewî û civakî. Em ê bi ser bikevin. Serkeftin ya me ye. Lê, ji boyî serkeftinê jî divê em li gorî pêdivîyên heyamê xwe bi rêxistin bikin.

# Dîroka kevnar a Durziyan

**Volqan Elî**

Rast e, vê carê jî Erdoğan bi xwe nikarîbû ku Tirkiye bike Osamaniya Nû. Lê em ji bîr nekin kesekî wekî Colanî, yanî HTŞ li Sûriyê peyda kiriye. Ji bo ku dilê xwe rihet bike, vê carê dixwaze Colanî bike, Kuyucu Murat paşeyê nû yê Osmanî.

Hûn ê bêjin, kî ye ev Kuyucu Murat paşeyê Osmanî, ku Tayip dixwaze Colanî bişibîne?

Kuyucu Murat paşe, ‘devşirme'yekî Balqanî ye. Osmaniyan ber bi dawiya sed sala 16. çûne, bav û dayik û eşîra wî tev kuştine û ew jî ji xwe re anîne. Paşê, ew perwerde kirine ji xwe re kirine paşeyekî bê rehm, bê dîn û îman. Di van serdeman de di navbera Osmanî û Sefewiyan de şerên xwînavî diqewimîn. Elewiyên Kurd ên milê Sêwas, Meletî, Mereş, Dîlok û hwd. ji ber ku ji zilm û zordariya Osmanî bêzar bibûn, hê zêdetir xwe li Şahê Sefewiyan digirtin. Heta paşê beşek ji wan, ji aliyê Şahê Sefewiyan ve li Xorasana Îranê hatibûn bicihkirin.

Osmanî ji bo ku pêşî li vê tevgera Elewiyên Kurd bigire, di demên cuda de 40 hezar Elewî zindî bi zindî avêtibûn bîran û qetl kiribû. Vaye paşeyê Osmanî ku vê komkujiyê dike jî, Kuyucu Murat paşeyê xwînxar bû. Di van serdeman de serhildanên Celaliyan jî Osmanî pir tengav kiribû; Kuyucu Murat paşeyê bavpîrê Erdoğan e (jixwe halê hazir, Erdoğan jî li gorî ku wî gotiye bi eslê xwe Gurcî ye lê ji Tirkan Tirktir e) bi şûrê dewleta Osmanî bi dehan hezar berxwedêrên Celalî qetl kiribû. Di van serdeman de jî, gelên berxwedêr û Osmanî di pêvajoyeke pir germ re derbas dibûn. Ne tenê Elewiyên Dêrsima jêr, berxwedêrên Celaliyan di nava tevgerê de bûn.

Sal 1607, wan derdoran... di vê demê de jî, li aliyê Kilis (ku niha li Bakurê Kurdistanê ye, nêzîkî Dîlokê ye) êl yan jî eşîrên Durzî yên Canbolatan, ji zilma Osmanî re nabêjin ‘em di bextê de' û ‘eman'. Timî Osmaniyan tengav dikin. Dawiya dawî Osmanî jê re çare nabîne, wî qetilê Elewiyên Kurd û Celaliyan, Kuyucu Murat paşe, dişîne ser Canbolatên Durzî. Şer û berxwedanên mezin diqewimin... Piştî berxwedaneke bêhempa, Osmanî, beşeke pir mezin a Durzî-Canbolat mişaxtî Libnan-Suriye kir. Vaye dîroka pir kurt a Durziyan... Niha jî Tayip ber dilê Colanî xweş dike ku wî bike, Kuyucu Murat paşeyê nû. Em nizanin bi talîmata Erdoğan bû, yan bi ya Colanî bû, cîhadîstên DAIŞ'î li hin bajarên wekî Ceremen, bi dehan Durzî qetl kirin. Eger ne wisa bûya, çima Erdoğan gava Durzî hatin qetlkirin dengê xwe dernexist. Lê dema ku Îsraîl li HTŞ'ê da, dilê wî bi HTŞ'ê şewitî?

Mixabin e ku Durziyên bi sedan sal e ji beriya vê ji ber şûrê paşeyekî Osmanî ji welatê xwe mişaxtî bibûn, niha jî dibin qurbaniyên HTŞ'ê. Mişaxtîbûn dibe ku çarenûsek ku hêzên bêbext ferz kirî be, lê parastina cewherî ji bo gelê Durzî, di asta mirin û mayinê de girîng e. Çawa ku Xweda mirov û kaînat afirandiye, pê re hîkmet û amela ku xwe ji şer û xêrnexwazan bi parêze jî daye.



## Bendava Şehîdan: Têkçûna pergala osmaniyên serdemê

**Dilyar Cizîrî**

Roja 5'ê Gulanê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê di nava berxwedêrên Bendava Tirşrînê de serkeftina mezin ragihand. Ev serkeftin piştî berxwedana gel a nêzî çar mehan bê navber li ser bendavê û şehîdbûna kerwanekî qehremanên herêmê yên ji hemû pêkhateyan, pêk hat. Berxwedana li Bendavê di demekê de li tevahî Sûriyayê guhertinên mezin têne jiyankirin, çêbû. Di vir de gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyayê bi hêza xwe ya leşkerî û sivîl, isbat kir heger gel xwe li ser esasê ŞERÊ GEL Ê ŞOREŞGER birêxistin bike tu hêz wê nikaribe vîna wî bişkîne. Min berê jî di nivîsa xwe ya roja 22'ê Nîsana îsal de bi sernavê ‘Bendava Tişrînê Kobana duyemîn e!' gotarek weşand. Ez ê îro car-ke din dubare bibêjim ku Benava Tişrînê ji bo biratiya gelan û hêza hevgirtina gel bûye nimûneyek din a berxwedanê. Çawa li Miştenûr Arînan evsaneyên dîrokî nivîsandin û bûn ilhama tevahî cîhanê. Îro Berxwedana hevalên me yên şehîd di şexsê Bavê Teyar, Bavê Hogir, Cîhan Bilgîn û Egîd roj de em hemû şehîdên berxwedanê bi rêzdarî bibîr tînin. Bi ked û têkoşîna wan ev bû xeleka duyemîn a evsaneya Arîn Mîrkan ku li ser Girê Miştenûr hate nivîsandin. Wan Bendava Tirşrînê veguherand keleheke din a serkeftinê. Li Kobanê DAIŞ'ê bi hemû hêz û piştevaniya xwe têk çû. Li Bendava Tişrînê Dewleta Tirak û bi hezaran çeteyên wê têk çûn. Di herdû dîmenan de wêrekiya gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyayê û fedekariya wan zindî bû. Bendava Tişrînê bi tovê berxwedana Kobanê mezin bibû. Îro bi ragihandina serkeftinê re, berhem û destkeftiyên serkeftinê radestî zarokên Sûriyayê dike. Çima ez dibêjim Sûriyayê ji ber serkeftina Berxwedana Bendava Tişrînê wê bandorê ne tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriyayê bike. Di heman demê de wê destê dirêj ê dewleta Tirk û çeteyên biyanî yên ji gelek aliyên cîhanê ku îro di Sûriyayê de wêranî û xirakirinê dikin, qut bike. Ji lewma pêwiste em bêjin serkeftina Bendavê ya tevahî gelê Sûriyê û têkçûna pergala Osmaniyên serdemê ye. Li bendavê bersiva komkujiyên Berava Sûriyayê û kujerên bi dehezaran gelan hate dayîn. Di heman demê de riya parastina durzî û hemû pêkhateyên Sûriyê yên li dijî tundrewyê ye. Çawa serkeftina li Kobanê bû zemîna bingeha têkbirina çeteyên DAIŞ'ê, ji îro ve em dikarin bêjin serkeftina Bendava şehîdan wê bibe zemîna têkçûna pergala tundrew û şidetê. Ji vir ve wê pêlên guhertina di Sûriyayê de destpê bike. Bawer im encamên wê jî wê di çend mehên pêş de zelal diyar bibe. Min got çend meh, dibe wiha dirêj neke jî. Wiha diyare ev serkeftin wê bibe zemîna hevgirtina gelên azadîxwaz ên ji bo avakirina Sûriyaya demokratîk amadene. Li ser vî esasî ji me û tevahî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyayê tê xwestin ku li ser esasê hevgirtina gelan ji bo Sûriyaya demokratîk têkoşîna xwe li ser asta Sûriyê û derve mezin bikin. Heger em wateya serkeftina Bandava Tişrînê bi pêkhateyên din ên Sûriyayê re nedin naskirin, wê bar girantir bibe.



# ‘Rêberê ku hesabê dijmin û hêzên navnetewî bi bin xistiye, divê bê xwendin'

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de piştî Banga Rêbere Abdullah Ocalan a ji bo Aştî û Civaka Demokratî, asta Xwendina parêznameyan Rêbertî bilindtir kirin. Koordînasyona Kongra Star a Kantona Qamişlo Newroz Xelîl diyar kir ku ji bo girîngiya têgihiştina nameya ji bo jinan hatiya şandin û pêvajoyê, wan pêwîstî bi xwendina parêznameyan dîtin.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji destpêka şoreşa Rojavayê Kurdistanê re, xwendina parêzname û pirtûkên Rêber Apo weke çandekê ku xwe li ser perwerde dikin dibînin. Ev yek di tevahî pêvajoyan re nehat rewastandin û heyanî niha jî weke awayê xweperwerdekirinê tê domandin. piştî Banga Rêbertî a Aştî û Civaka Demokratîk, careke din xwendina parêznameyan destpêkirin. Ev xebat ji aliyê Kongra Star a Kantona Qamişloyê bi tayebet piştî nameya Rêbertî ji bo hemû jinan rêkirib, hat destpêkirin. Têkildarî vê yekê Koordînasyona Kongra Star a Kantona Qamişlo Newroz Xelîl ji rojnameya me re axivî.



### Rêberê ku hesabê dijim û hêzên navnetewî bi bin xistiye, divê bê xwendin

Newroz di destpêkê de xuya kir ku Rêber Apo di girava Îmraliyê de li gor her pêvajoyekê parêzname nivîsandin û got: “Rêbertî di girava Îmraliyê de têkoşîna azadiya tavahî gelê kurd da meşandin. Rûxmî şert û mercên dijwar û zehmet yên girtîgehê lê Rêbertî tu carî bê îrade nema û ji gelê xwe re digot “yên ku azad bibin hûn in ne ez im”. Bi vê re em asta aîrade û zanebûna Rêbertê fem dikin ku di aliyê hişmendî û îdolojiya xwe de şiqas azad û serfiraz e. Dijminê gelê kurd bi girtina rêbertî re negihîşt tu encamê, hêviyên ku wan dikirin ji salên 90'î û heyanî vê demê yek jî pêk nehat û bi ser neketin. Ev bi serê xwe têkbirina hêza navnetewî a ku dixwastin di şexsê Rêber Apo û gelê kurd de felsefeya azadiyê û doza gelê kurd bibin xistibana.

Rêber Apo di hinder girtîgehê de li gorî pêvajo û merheleyên ku di tevahî cîhanê, Rojhilata Navîn, Kurdistan û gelê kurd tê re derbas dibû, Parêzname û pirtûkên têr û tijî derxistine. Bi derketina her parêznameyekê re dijmin ditirsiya û hesabên xwe careke din nû dikirin. Rêberê ku hemû hesabên dijmin têk birine û rêbertî ji tevahî gelên bindest re kiriye, divê pirtûk û ramanên wî di nava hemû gelan de bên xwendin û perwerdekirin”.



### ‘Li gorî pêvajoyê me pêwîstî bi xwendina parêznameya 5'emîn dît'

Newroz da zanîn ku bi banga Rêbertî a Aştî û Civaka Demokratî û nameya ku ji hemû jinan re şandiye divê careke din xwekurkirin di vê felsefê de bê kirin û wiha domand: “Banga Rêbertî û nameya ku ji bo jin şandiye, pêvajoyekî nû û perispektîvên nû dan pêşiya jina kurd. Ev name di gelek aliyan de hate nirxandin û şîrovekirin. Hezkirin û daxwaza Rêbertî ji jina kurd û jinên azadêxwaz re; diyarker û zelal bû. ji lewra me dît ku ji bo hîn zêdetir em xwe di cewherê vê nameyê û erka li ser milê xwe hîn zêdetir li gorî pêvajoyê birêxistin bikin, me pêwîstî bi xwendina parêznameya 5'emîn a Rêber Abdullah Ocalan dît”.

### Kampanya xwendina parêznameyê

Newroz Xelîl di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: “Li rex tiştên ku me anîne ziman li ser asta Rojhilata Navîn û Kurdistanê gelek guhartinên cidî hatine jiyankirin. Bi taybet di aliyê yekîtiya gelê kurd de gavên dîrokê hatin avêtin. Hemû geşedanên ku îro tên jiyankirin di pirtûkên Rêbertî de hatine nirxandin, şîrovekirin û şareserî çiye hatine zelalkirin. Me jî Kongra Star li Qamoşlo dest bi Kampanya xwendina parêznameya 5'emîn kiriye. ev xwebat wê di hundir her komîn, meclis û saziyekê de bê pêkanîn. Her wiha ji aliyê komisyonan ve bê şîrovekirin. Helbet armanca me ew e ku gel ji nêz ve rewşa heyî bi nêrnên Rêber Apo bixwîne û nas bike ye”.

## HTŞ'ê Sûriyê ber bi nezelaliyê ve dibe



**Zekî Bedran**

Bi hişmendî û şêwaza siyasî ya ku HTŞ'ê nûnertîya wê dike, pirsgirêkên li Sûriyeyê çareser nabin, aramî û demokrasî pêk nayê. Sûriyê di hembêza xwe de ji pir netew, bawerî û çandan dihewîne. Bi salan ji aliyê yek partiyê, pergala Baasê ve dihat birêvebirin. Pergala zordar û zêde navendî, yekdest di dawiyê de bû sedema şerekî navxweyî û dijwar. HTŞ'ê dixwaze vê şêwaza rêveberiyê ya ceribandin û felaket bi rengek xirabtir dubare bike. Ew oleke ku li ser şirovekirina teng a mezhebekê li nijadperestiya Ereb zêde dike. Bi vê hişmendî û nêrînên tûnd, Sûriye wê çawa bi cîhanê re bibe yek û aştî û aramiyê pêk bîne? Kesên ku li hember Sûriyê hestiyar û berpirsiyar in, nikarin û divê li hember diziya şoreşê bêdeng nebin, raste şoreşa Sûriyê bi destê HTŞ'ê tê dizîn. Li şûna şoreşê, rêbazên derbeyê tên ceribandin. Ji ber ku nikarin gel, çand û baweriyên cuda hembêz bikin, dixwazin pirsgirêkên ku derdikevin holê bi tundî û çekdarî çareser bikin. Li dijî avakirina Sûriyeke demokratîk bisekinin. Bi zanebûn derdorên demokratîk û hêzên rêxistinkirî ji pêvajoya avakirinê dûr bixin. Dixwazin dewletê li gorî têgihiştina xwe ava bikin. Weke ku kesekî din li dijî Baasê li ber xwe nedaye û şer nekiribe tevdigerin.

Dema HTŞ'ê li Şamê bi cih bû, hemû zindîbûna şoreşê û bendewariyên gel li aliyekî hişt. Ew kesên ku serî li ber wan nedan û yên ku daxwazên wan ên cuda hebûn, ji derve hiştin. Dema ev yek pêk hat, ji bilî wan û derdorê nêzî wan ti kes li desthilatdariyê nema. Kurd, Durzî, Elewî, Mesîhî û Erebên cudaxwaz hemû ji pêvajoyê hatin dûrxistin. Di peymana ku desthilata Şamê bi Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê re îmze kiribû de, xalek hebû ku wê li tevahiya Sûriyê agirbest bê ragihandin. Mîna ku ev peymana bi îmzeya Ahmet Şara û Mazlûm Abdî hatibû îmze kirin tineye, îro li Sûriyê li gelek cihan şer û êrîş heye. Peymanên ku ji aliyê HTŞ'ê ve hatine îmzekirin jî bê wate dixuye. Gelo ka em çawa dikarin ji daxuyanî û biryarên wan bawer bikin? Qaşo Yekî ji wan Durzîyan bi xerabî qala Pêxember kiribû. Ew dikare bibe. Di her civakê de mirov û tevgerên cuda fikirin hene, dibe ku tevlîhevî jî derkevin pêş. Ger sûcek hebe lêbûrînê ji gelê Elewî bixwaze û berpirsên rêveberî lêkolînê dike û zagon û darazê dixe meriyetê. Lê HTŞ'ê ne agirbesta ku îmze kiriye li ber çavan digire û ne jî pêvajoya zagonî dişopîne. Hêza leşkerî rasterast dişîne taxên Durzî û li dijî wan êrîş dide destpêkirin. Di van pevçûnan de bi dehan, bi sedan kes hatin qetilkirin. Peywendiyên di navbera civakan de tên têk birin.

Durziyan li hemberî wan êrîşan berxwedanî kirin û gotin em ê têkoşîna xwe bidomînin. Ragihandin ku baweriya wan bi HTŞ nayê û ji bona mal û ewlehiya xwe bi gumanan jiyan dikin. Di heman demê de jî, pêşniyara parastina navnetewî kirin. Ev rewşek ne ji rêzê ye. Hîn derdor dikarin bêjin ev sîxûrin û Israîl wan rêve dib e. Israîl bi vekirî dibejê “Ez dijî HTŞ'ê me.” Lê HTŞ'ê ger hemberî gelê xwe birêzdarî nêz bibe û hêvîyên wan pêk bîne Israîl jî nikare Durziyan bixe tevgerê. Heya niha jî Durzî radigihînin ku ew heznakin ji Sûriyê cuda bibin. Lê ger hebûna wan bikeve di nav metirsî û xeteriyê de kê ji bona wan dest dirêj bike dê wan hembêz bikin. HTŞ'ê dê kiryarên ku li dijî Elewîyan hatibûn kirin lêpirsîn kiriba. Qaşo desteyekê lêpirsînê ava kiribûn. Di ser de meh derbas bûn lê çi daxuyanî nehatin dayin. Rêveberên HTŞ'ê ti rexnedayin jî pêşnexistin. Komkujiyan bi fermî nagire li ser xwe, lê kiryarên diqewimin jî na veşêrin. Ji demê re belav dikin ji bona were ji bîrkirin. Ger HTŞ'ê cidî û berpirsyarî nêz bibe, lêbûrînê ji gelê Elewî bixwaze û berpirsên komkujiyan darizîn e. Heya niha yên ku tevlî komkujiyan bûne, ti kese ne bihîstiye ku hatine girtin û dadgeh kirin. Israîl ragihand ku li hemberî êrîşên ku li ser Durzîyan tên kirin wê bê deng nemînin. Çend herêmên Sûriyê bi êrîşên esmanî bombebaran kirin. HTŞ bi ti awahî bersiv nade wan êrîşan. Hêza wan tenê li hemberî welatiyê wan e. Dema ku ew zeft kirin, ji serjêkirina wan re dudilî nabin. Têgihiştina wan a desthilatdariyê pir tûndrew û navendî ye. Weke desthilat hemû rê û rêbaz ji wan re vekirîn e. Ji çanda jiyanekê hevpar û lihevkirinê dûr in. Tiştê ku dizanin seran jêkin û zextê ferz bikin. Sûriyê derfeteke mezin bi dest xist. Ger HTŞ'ê bi pêkhateyên din re li hikûmetek ava bikira û tevlî xebatên destûrî bikira, ev nakokî nedibûn û Sûriye ji destwerdanên derve re vekirî nedibû. Niha Îsraîl bi awayekî vekirî êrîş dike, destwerdana wê tê dîtin û rexnekirin. Lê destwerdana Tirkiyê mezintir e. Herêmeke berfireh a Sûriyê di bin dagirkeriya dewleta Tirk de ye. Hîn jî bi deh hezaran çeteyên çekdar di bin fermandariya Tirkiyê de ne. Tirkiye siyaseta navxweyî û derve ya Sûriyê û avakirina dewletê birêve dibe. Wisa dixuye ku HTŞ'ê di vê siyaset û nêzîkatiya desthilatiyê de israr dike. Di vî warî de hemû gelên li Sûriyê xwe di xetereyê de dibînin. Ger parastinekî navdewletî hebe, ne tenê ji bo Durzîyan, pêwiste ji bo hemû gel û pêkhateyên din jî be!



## “Qanûna Tuncelî”

**Farûk Sakik**

Di 4'ê Gulana 1937'an de Desteya Wezîran Qanûna Tunceliyê derxistin. Ev qanûn bi îmzeya Ataturk ket meriyetê. Xalek girîng a qanûnê wiha bû: “Ji bo cezakirina kesên ku li dijî fermana mufetîşê giştî yê parêzgeha Tunceliyê tevdigerin û yên ku li dijî desthilata dewletê derdikevin, wê tedbîrên leşkerî werin girtin.”

Piştî vê qanûnê çibû çi nebû dîrokê şahidî kir. Êş û birîn roj bi roj zêde bûn. Li herêmê tirs belav bû. Tirsa herî mezin jî ziman bû. Herdu alî ji ‘ziman' ditirsiyan. Kurdan digot, zimanê me wê tune bibe. Dagirkeran digot, heger ev ziman tune nebe wê qirkirin jî pêk neyê. Ditirsiyan wê çawa pêşî lê bigirin. Qedexe kirin. Yên axivîn cezakirin. Piştî demek jî sirgun kirin.

Bandora herî mezin li ser kesên bi emir-îxtiyar kir. Kurd ji bo zarokên xwe ji vî cezayî biparêzin, axaftina bi Kurdî qedexe kirin. Dê û bav li malê, li odeya paşî û ji bo ku zarok pê nehesin, bi dengekî nizm diaxivîn. Ziman û nasnama xwe vedişartin.

Dersim dihat valakirin. Koçberî û sirguna metrepolan dest pê kiribû. Li van deran êdî Kurdî axaftin daketibû asta herî jêr. Ziman û nasname bi hev re diheliya û tune dibû. Îroj ji gelek kesan dema dipirsin tu ji ku derî? Bersiva rasterast nabejin em ji Dersimê ne. Dibêjin bapîrên me ji Dersimê hatine. Lê li aliyek jî hin ciwanên ji Dersimê bi du raboriya xwe-dîroka xwe ketin. Dîroka xwe lêkolîn dikirin. Li bersiva, em ji ku derê hatine vê derê digeriyan. Di encama lêgerînê de, di arşîva mêjiyan de rastî ‘qanûna Tuncelî' hatin.

Di sala 1978'an de dema ku bi navê PKK'ê tevgerek derket qada têkoşînê, me dît herî zêde ciwanên herêma Dersimê di nav vê tevgerê de cîh girtin. Sakîne Cansiz, Alî Haydar Kaytan, Riza Altun, Hamilî Yildirim û hwd. Van kesan li du lêgerîna zimanê ku dê û bavê wan li odeyê paş diaxivîn ketibûn. Bandora Qanûna Tunceliyê ya sala 1937'an, di sala 1995'an de xwe nîşan dida. Kurdan bi navê Med Tv televizyonek ava kiribûn. Di vê televizyonê de bernameyên zazakî hebûn. Lê mêvanên ku bi zazakî biaxivin nedihatin dîtin. Mêvan di bernameyê de ji zazakî zêdetir, ji sedî 80 bi Tirkî diaxivîn. Trajediyek bi vî rengî hebû û dibiya ku midaxle bihata kirin.

Bi tevgera azadiyê re hin saziyên parastin û pêşvexistina ziman hatibûn avakirin. Terteleya sala 1937'an de bandorek wisa kûr li vî zimanî kiribû û ji nû de zindî kirin hêsan nebû. Lê bi demê re pêşketinên mezin çêbûn. PKK'ê îroj bi têkoşîna xwe dixwaze Kurdên bi ‘qanûna Tuncelî', Dersim û nasnameya xwe terk kirine, ji nû de vegerîne kodên wan yê berê.

Rêber Apo di hemû hevdîtinên xwe yê bi dewletê re, van qanûnan bi bîra wan dixe. Ji dewletê dixwaze ji bo ku bûye sedemên trajediyên bi vî rengî îroj serdemek nû bide destpêkirin. Banga Aştî û Civaka Demokratîk dike. Ji dewletê dixwaze ev qanûna bûye sedema hemû ziyan-tehrîbatan telafî bike. Ev banga wî dengekî mezin veda. PKK'ê derbasî qonaxeke nû dibe. Di têkoşîna xwe de derbasî siyaseta demokratîk dibe. Dewlet jî bersiv dide vê banga wî.

Rêber Apo di vê pêngavê de di heman demê de, ji bo Kurdên bi ‘Qanûna Tuncelî' axa xwe terk kiribûn di vegerê de wê têkoşîneke bi çi rengî bidin, hin perspektîf pêşniyar dike. Heger hin kesên ku venegerin ser axa xwe jî, çawa dikare vegere nasnama xwe, rê dide pêş wan.